Rûdanek Stiranek



Berhevkirin: Dr. Selah Hirorî

Rûdana devera Gulî ya di stirana dîrokî ya kurdî de

Li (18) tebaxê sala 1919 ê leşkirê berîtanî hêriş kiribû devera Gulî ya, ev- leşikire yê ji du hêzan pêk hatibû, hêza jeneral Wildirc, hêza jeneral Nayitinkîlî jî li gel fewiceka asuriyan. Hêrişa berîtanî li nîva îlunê gehiştibû devera Guliya û deverên Behnîne û kela Şabaniyê û Deştka çiyê û mila erebê hemû kirine jêr kontrola xwe ve. Piştî Berîtaniya ev devere hemû girtîn, Sadqê Birûy û li gel Silêmanê qutê Tahir axayê Hemzanî û Hecî Reşîd begê Berwarî û Hecî Şeban axayî û Heso Dînûy dest bi bergiryê kir û bi çend qunaxan devera Guliya ji leşikirê berîtanî paqij kir. Di şerê êkê de gundê Behnîne kete di destê hêza kurdî de û di şerên dî de kela Şabanyê hate standin, paşî Deştka çiyê (ku leşkirê inglîzî ordiya xwe li wê derê danabû) ew jî hate standin û di qunaxên dî de gundê mil erebê jî kete di destê hêza kurdî de û heta li dûmahyê leşikirê berîtanî neçar bû xwe ji bajêrê zaxu bi vekêşe. Hejî gotinê ye ku leşikirê berîtanî bi hêzeka mezin ve hêriş kire devera Gulî ya, herçend e bergiriyeka mokum ji layê kurdan ve hatibû encamdan nexasme li çeperê Behnîne û kela Şabanyê, belê ji ber hêza berîtanî û çekê wê yê giran serokêlên pişkdar di van rûdanan de neçarbûn dest ji şerî berdin û merema wan ew bû da ziyanên mezin bi xelkê ve nekevin û xwe kêşa di nav devera goyiyan de û ev devere jî tuşî hêrişa berîtanî bû heta şiyan

bigehine devera Guliya û gundî Kirurê bisujin.
Di van her du stiranan de, bi tinê behsê rûdanên yan serkeftina hêza kurdî kiriye demê leşkirê ingilîzî ji deverê dûr kirî û heta bajêrê Zaxo birî, dîsan behsê qumandariya kurdan kiriye li deverên şer lê hatiye kirin wekî li (kela Şabanyê, tenga bankê û Deştka Çiyê û mila erebê û şêla şêlmazîkî) û behsê alîkariya asuriyan jî (tiyarî ya) jî hatiye kirin. Ku ewan alîkariya berdewam bo leşikirê ingilîzî kiriye nexasme demê hêriş kiriye hindek deverên ku leşkirê inglîzî nedişiyan bigehitê û dirêjahiya van her du stiranan eve ye:

Şerê Şabaniyê**

Şerekê çêbû li şabaniya mîra wa bi dare
Eskerê îngilîzî nahête hisaba bi hezare
Şadan û navimşûdê Sadiq axa babê Brahîm gelek hene
Bi sê denga dikete gazî Silîmanê qutê gelî xurtê kurda bab û bira lep hilînin çavê xwe ji kurda neniqînin
Destê xwe li bazin zîva bigehînin
Sê qirarê Xwedê li babê Brahîm keftbê
Îro ezê nava vî leşikirê dewletê
Ezê jê bikujim bi temamî bi hezaran
Şerekî çêbû li Şabaniya mîra
Şer xweş bû kefte vî girikî
Şadan û navimşûdê Sadiq axa babê Brahîm gelek hene
Bi sê denga dikete gazî Silêmanê qutê law lezê bikin bilezînin
Destê xwe bi bazin zîva bigerînin
Çavê xwe li xurtê kurda neniqînin
Sê qirarî xwedê bi min keftbê
Îro ezê berdeme vî eskerê inglîzî
Li şabaniya mîra heta deştka çêy
Ez vî eskerê dewletê ji Deştka girikî berê wî deme bajêrê Zaxoyê
Weyî dunyayê weyî dunyayê weyî dunyayê
Wey la pûçê betalê berê kefte vê fenayê
Şerekê çêbu li şabaniya mîra
Xwedê dizane vê subê min gu wa bi dar e
Qarîn û Nalîn kefte nav eskerê inglîzî li deştka çêy
Şadanu navimşwîdê sadiq axa babê Brahîm geleg hene
Sê denga dikete gazî Silêmanê qutê Hesoyê Dîno bab û bira lezê bikin bilezînin

Mêrê baş bin destê xwe li bazin zîvê bigerînin
Eybe ji we re çavê xwe ji xurtê kurdan neniqînin
Sê qirarê xudê bi babê Brahîm bi kevin
Îru ezê bikujim zabtê kulav xware
Weyî dunyayê weyî dunyayê weyî dunyayê weyî la layê pûçê betalê
Salê ber vê salê
Berê kefte fenayê
Şerekê çêbû li Şabanyê li şêla şêlmazîkê
Ezê bêjim wa bi teraşe
Eskerê inglîzî zorî zehfe li gel sikerê hinduka felê tiyariya xîfet cadir kêşane nave
Dengê tup û cebilxanê dewleta inglîzî gelek hene
Serserê babê Brahîm lêda ji êvara Xwedê û pêda ezî bêjim wa li paşe
Şadan û navimşûdê Sadiq axa babê Brahîm gelek hene
Yan dikî Silêmanê qutê gelî bab û bira lezê bikin bilezînin
Destê xwe li bazin zîva bigerînin
Çavê xwe li xurta neniqînin
Sê qirarê Xwedê bi babê Brahîm kefitbê
Ezê navê eskerê inglîzî wa bi me qesabê baş e
Weyî dunyayê weyî dunyayê weyî dunyayê

Stirana şerê tenga bankê ***

Delê lê delê lê
Şerikê li me qewimî
Li diyarî tenga vê bankê
Herbeka giran li me qewimî
Li diyarî tenga vê bangê
Şad û şûdê Sadqê biro gele hene
Bi sê denga gaz dikir Silêmanê qutê
Gelî lawên Gulî ya
Gelî lawên Kurdistanê
Dest hilînin îro fermana xwedê hatî ser serê me
Fermaneka girane ez bi tinê
Heger rebê mezin ji min re hasil bikit
Çi gava ez destê xwe bi deme darê elemanê
Minê swîndeka xwerî bi qesemê bi ayatê bi quranê
Ezê şerikî kim û li gel hukmeta îngilîzî
Ezê pêşahîka eskerê gawrî dagêrim

Ezê bibim deşta vê girikê
Ji êvara gundan û pêda hucirîmekê bikêşim ser sikerê îngilîzî
Li ser kum û kemînên deşta vê girikî
**** **** **** ****
Were delê lê delê lê delê lê
Şerekê li meqewmî
Ezê naçime tenga xupanê
Li hindavî avê
Ezê naçime kela Şabanyê bilinde
Bila xwedê ava biket wa li hindavî avê
Şade şûdê Sadqê biro gelek hene
Bi sê denga gazî dikit Silêmanê qutê
Gelî xurtên Kurdistanê
Gelî lawên Guliya dest hilînin
Minê sûndeka xwarî bi qesemê bi ayetê bi quranê
Çi gava ezê destê xwe bi deme darê elemanê
Min soz û peymanên dayin
Ez hicirîmekê bi kêşim ser eskerê îngilîzî
Ez ne hêlim ew seyî babê
Li ser topê li pişta darihuzanê
Topê bavê
Delê lê delê lê delê lê
**** **** **** ****
Ezê naçim gela Şabanyê
Kela Şabanyê bilinde kenidalê asê
Rêga lê dest berware
Şade şûdê Sadqê biro gele hene
Bi sê denga gazî dikit xortên Guliya
Silêmanê qutê bira tu mêrî çêbe dest hilîne
Minê sûndeka xarî bi qesemê bi ayatê bi quranê
Ez nekujim cindî ya kurên feqîr û jara
Ez bikujim zatban û mîlazma
Ne wila zêde barî sê tanc û sê necima kulavxwara
Delê lê delê lê delê lê
Stirana şerê mila erebê

*** ji zardevê stiranbêj Ferîq Êkîleyî hatiye wergirtin, ji arşîvê Şivan Şukrî Hirorî ye